# DÊM Û LÊV

## Wenda Şêxo

**Min gul- dêmên xwe**
**Dane lêvên te**
**Û sitêrên ezmanê min**
**Bi xewnare dane rê….**
**Dêm birîndar bûn**
**Ji firmêskên janê**
**Û dişirikîn**
**Wek wan solavên**
**Li serê rê……**
**Evîna te**
**Neyarekî ne diyare**
**Dilê min xistîye bin  barê xema**
**Elendê binoşe**
**Tê bibîne tîrêjên rokê**

**Ji çavê min**
**Didin der ……**
**Evîna min**
**Razeke ezmanîye**
**Û balindeyê çolê**
**Tim mêvane**
**Li sitêra nîvê şevê**
**Ku lêvên wî**
**Gul-dêmê min**
**Dibe beyanîya sibê…..**
**Û jana evîna min**
**Ji evîndaran re didêre….**

8\2007 Qamişlo